

Dumahîk : Hevpeyvîn....

binivîsîn

3- TEVKURD, yekîtiyeke siyasî ye. Ji bona vê armanca wê yêkem ew e ku hêzên û welatparêzên Kurdistanê bike yek. Tevgerandina wan pêk bîne. Lê ev naye wê wateyê ku TEVKURD ji bona çand û zimanê kurdî xebat nake. TEVKURDê di programa xwe de pejirandiyê ku zimanê kurdî li Tirkîyeyê bibe zimanê fermî û perwerdayî.

TEVKURD di qada siyasî de ji bona ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdayî xebat dike. Lewra TEVKURD baş dizane ku dema ku zimanek nebe zimanê fermî û perwerdayî, pêşketin û dezgehên wî zimanî nabe. Ji bona vê TEVKURD, propagandayê wê yekê bi xurtî, bi riya çapemenî dimeşîne.

TEVKURD, ji bona ku dezgehên ziman û çanda kurdî pêşbixin ava bibin, dibe alîkar. Ji nivîskarên kurd re piştgirî dike. Kursê zimanê kurdî dimeşîne. Dezgehên heyî yên ku ji bona ziman û çanda kurd xebat dikin re jî alîkar e.

4-We hewil dabû ku hun berevaniya xwe devkî û nivîskî bi zimanê kurdî pêşkêşî dadgehê bikin. Sedema wê çiyê ku we xwestiyê bi zimanê kurdî li dadgehê bipeyivin û bixwînin ne bi zimanê Tirkî?

4- Baş tê zanîn ku piştî şerê-sar li Tirkîyeyê û li Kurdistanê jî gelek guhertin hatin holê. Vê guhertinê li ser stratejî û awayê xebata me jî tesîr kir. Xebata kurd û Kurdistanê ket nav welêt û bajaran. Ez girêdayî van guhertinan vegeyriyam Kurdistanê, min biryar da ku xebeteke vekirî, bêhîtiatkar bimeşînim.

Di merheleya yekem de ji bona ku li Tirkîyeyê dewlet bibe dewleteke federal, dewleta neteweya Kurd û Tirk, Kurd li Kurdistanê bibin xwediyê dewleta xwe ya federe min stratejiyek pejirand.

Li dadgeha bi kurdî axevtin û parêzname pêşkêş kirin beşek ji ev stratejiya min a bêhîtakariyê ye.

Sedema duyem ew e ku ez dixwazim di dadgehên tirkan de îspat bikim ku zimanê kurdî heye, zimanekî xurt e û zimanê îlîm e.

Sedema sêyem ew e ku bi kurdî li her derê û li dadgeha axevtin, mafê min e. Divê ez tehemûlî encama kurdî axevtina xwe bikim.

Sedema çarem jî ew ek ez dixwazim di nav rewşenbîr û hiqûqzaneyên kurdan de tirsê bişikînim.

Sedema pêncem jî ew e ku dema li dadgehan parêzer û girtiyên kurperwer bi kurdî rêvebirina dozên xwe bikin, dewleta tirk ji aliyê siyasî û malî de dikeve zehmetiyek û tengesiyeke gelek mezin.

5-Rewşa axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî li bakur di çi warî de ye û hêviyên we çine?

5- Pirsê girîng ew e ku ji bona zimanê kurdî li Bakurê Kurdistanê konseptek û siyaseteke diyar û hevmeşterek derdikeve holê. Ji bona ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyî, di nav hemû kurdan de hevmeşterekiyek heye. Ji demên berê zêdetir giringiya zimanê kurdî tê fahm kirin.

Li Bakurê Kurdistanê axevtin û nivîsandina kurdî pêşdikeve. Gelek rojname û kovar bi kurdî tên weşandin. Dezgehên Kurd, êdî zimanê kurdî wek zimanê fermî dipejirînin. Gelek rewşenbîrên kurd bi kurdî dinivîsin. Pirtûkên kurdî bi hejmar zêde dibe. Di mîhracanan de ji hemû beşên Kurdistanê beşdar bi kurdî qise dikin, kurdên bakur bi kurdî qise dikin. Kursên zimanê kurdî zêdetir dibin. Konferans, panel, semîner bi kurdî tên meşandin. Di televîzyonan de gelek qels be jî hewildanek heye.

Ji bona vê ez hêvîdar im ku di rojên pêş de zêdetir kesê kurdî bi axifin û bi kurdî.

D.R. (11)